

Qasimlo Y Pêşmerge

Ebdulla Hicab

21 sal bi ser şehîdbûna Dr. Abdulrehman Qasimlo re derbas bûn. Di wan 21 salan de gelek bas û şirove li ser kesayetî û rola Dr.



Qasimlo di tevgera Kurd li Rojhilatê Kurdistanê û nûjenkirina PDKî hatine gotin. Basa Qasimlo ê dîplomat, Qasimlo ê rewşenbîr, Qasimlo ê abûrînas, Qasimlo ê siyasetvan û H.W.D tê kirin. Dema ji bo 21 saliya şehîdbûna Qasimlo ji min daxwaz hate kirin ku li welatê Austriya (Utrîş) basekê pêşkêş bikim, cemedaniya serê Dr. Qasimlo û cilên wî yê pêşmergegatiyê ji her tiştî pitir bala min kişandin. Qasimlo ê PÊŞMERGE xwediyê gelek taybetmendiyên bû ku heya niha hin ji wan di munasibetên cuda de hatine baskirin. Qasimlo ê pêşmerge bi huner, edebiyat, abûrî, siyaset, rewşenbîrî û dîplomasiya xwe PÊŞMERGEYEK Kurdistanê bû. Eger mirov bixwaze taybetmendiyên wî pêşmergeyê pêşeng, ji "P" ya destpêkê re heya "E" ya dawî bi kinî bas bike, Qasimlo ê PEŞMERGE xwediyê pênaseyek weha ye:

Pêşeng

Dr. Qasimlo pêşengê têkoşîna azadîxwaziya gelê Kurd li Rojhilata Kurdistanê bû. Ev ne bi tenê weke serokê partiyek siyasî, lê weke mamostayekê hertim ji hevkar û hevbîrên xwe re sembola xwe nû kirin, guhertin, pêşveçûn û nûjeniyê bû. Qasimlo ê pêşeng ji bo avakirina kultûra demokratîk kedek mezin da. Di demekê de ku Rojhilata Kurdistanê ji bo guhdarîkirin ji takek pêşeng amade bû, Qasimlo basî kultûra xwe bi rêkxistinkirin û demokrasiyê da pêş heya ku kultûra takperestiyê li Rojhilata Kurdistanê bi cih nebe. Di bin mercên

dijwar de ev kultûr bi lêger û astengan re rû bi rû bû, lê keda Qasimlo encam jî da û bingeha kultûrek cuda ya ku rê ji bo demokrasiyê vedike ava kir. Rola pêşengbûna Dr. Qasimlo ji kultûra siyasî bi der, warên civakî û kultûrî jî bi xwe ve digirt. Di hemû salên dijware têkoşîna azadiyê û di bin mercên zehme tû şer de, Dr. Qasimlo rê neda ku jiyana asayî ji têkoşîna partiya ku wî serokatiya wê dikir bi dûr bikeve. Qasimlo hemû rengên jiyane dihebandin û pêşxistina siyasetê ji pêşketina civakê cuda nedikir. Lewma ji bo avakirina kultûrek li ser wê bingehê hertim di rêza pêşîn ya têkoşînê de bû.

Êş u azara gel.

Ji Qazî Muhemedê mezin re heya Qasimlo û Şerefkendî ê nemir, rêberên PDKî di jiyana û mirinê de hertim bi gelên xwe re bûne. Weke çawan Qasimlo xweşiyên gelê xwe parve dikir, di heman demê de jî ew di rêza pêşîn ya wan kesayetiyên de bû ku amade bûn ji bo xweşiya jiyana gel, bi xwe tama êş û azarê ji nêz ve hest pêbikin. Weke gelê xwe ev jî rastî koçberî û jiyana bi dijwarî hat. Li çiyana, di bin xêwetan de jiya û kete bin barana bombe û topên neyaran. Ji nêz ve şer dît u di dawiyê de jî weke hemû şehîdên gelê xwe rastî tîra dijminê xwe hat. Laşê bi xwînê xemiliye Qasimlo û hevalên wî nîşaneyê herî xurt bû ku derdixist çawan û heya ku Qasimlo di nava êş û azarên gelê xwe de dijî.

Şorişger

Şorişgeriya Dr. Qasimlo bi tenê di wê yekê de nebû ku wî ji bo guhertina sîstema deselatdar û avakirina sîstemek nû kar dikir. Wî guhertin ji xwe û ji partiya xwe re da destpêkirin. Ji bo ku guhertinan **D.R. (7)**

